Dumahîk : Kuştina….

hişê xwe ronî bikin, û bêhna xwe fereh bikin ; û yek ji van bê ya din nakeve xizmeta me kurdan ; û bi taybetî jî ya me êzdiyan. U hên bêhtir ê bêhtir jî ya me jinan ! ! Ji ber ku em buhayê wê giran didin. Ne xema tu kesiye ku em bi hev kevin hev bikujin û serê hevdu bibirrin ; û bi kevran û kuçan, an kêran, an jî bi qurşînan, kezeba xwe bisotînin. ew rengek ji reşkujiyê ye ! U nîşana nezanî,tarîtî û şûnde mayînê ye .

D'ua , Kurd a êzdî, tu canemergê, tu nemirê ; tu her saxê ; cihê te, di dilê xortekî tenê de hebû, xortên nezan, cihê te heya bi heyê (heta bi hetê) di kuranî ya dilê her kurdekî bi rûmet de çêkirin; laşê te di hişê wan de kêrt kirin ; destên te yên zarokane, ku te dirêjî dawa xwe dikirinê ku tu laşê xwe ji nêrînên hovan biparêzê, dawa fîstanê te yê bûkane, kirin perda reş û bi ser çavên kesên nezan de berdan ; û rojek bê ; wê bikin kefen ji dijminên şoven re ; destên te, va di destên hemû jinên kurd û yên cihanê de ne ji bona xizmeta mirovatî ; wekhevî ; û hildana zordestî yê.

Navê te li ser te ye, Diroz (du'a) li giyanê te be, Du'a, tu bû yê canemerga civakî.

****

Dumahîk : Hevpeyvîn…

divabû em bi zimanê Erebî bi merivên xwe re bipeyivin.

8- Di nerîna we de, ew hilwesta we ya wê demê ji pilana Kembera Erebî rast bû ? .

***Bersiv**:Di baweriya min de, ew daxuyaniya ku me wê hingê da weşandin rast û durust bû, mêranî û wêrekî li gora wê demê têde hebû. Bi gelemperî, em li kar û xebata xwe ne poşman in, çimku, li gor zanebûn û karîna xwe, me di ber mafên gelê xwe de kar dikir.*

9- Hun dixwazin çi ji tevgera gelê xwe re bibêjin apê hêja?.

***Bersiv**: Partiyên me yên kurdî îro li ser riya xebatê li ber xwe didin, lê, hêviya min ewe ku ew lêvegerekê ji xwe re ava bikin, ew lêveger, nûnertiya gelê kurd ser û ber bike. Ya din, ez avakirina ragihandina Şamê gaveke li pêş dibînim, gereke em destên xwe têxin destên hêzên Erebî yên demokrat û bi hev re em kar û xebatê ji bo welatê me hemiyan Sûriyê û ji bo gelê xwe yê kurd bikin. Di baweriya min de, bi vî karê hevbeş, emê karibin guhertineke demokrat a aştiyane di welêt de peyda bikin.*

10- Ji keç û lawên kurdan re, hun dixwazin çi bibêjin, çi şîretên we ji wan re hene?.

***Bersiv:** Şîreta min a pîşîn ji wan re ewe ku ew li zimanê dayika xwe xwedî derkevin, xwe hînî xwendin û nivîsandinê pê bikin, ji ber ku ew zimanekî şêrîn û delal e, gereke em ji nijad û zimanê xwe fedî nekin, çimku ew jî mîna zimanê gelên cîhanê ye, ya din, ez dixwazim ew guh bidin xwendin, rewşenbîrî û zanistiyê, ji ber ku dema me ya îro, dema xwendin û zanebûnê ye.Ya dawî, ez ji wan re dibêjim, ji hevdu hez bikin, destên hev bigrin, rûmeta hev nas bikin, bera kîn û berberî û nezanî di civaka me de nemîne.*

11-Gotina we ya dawî ji xwendevanên NEWROZ ê re çiye?.

***Bersiv**: Ez sipasiya desteya Newrozê dikim ku îro ez hatime bîra wan, dilxweş im ku we silavek daye kalemêrekî xwe, yê ku rojekê di ciwaniya xwe de, di ber doza gelê xwe de girftar bûye, silavên min, ji xwendevanên wê re hene, dilê min bi dîtina we geş bûye, ez bi hêvî me ku rojên bên, rojên aştî û wekheviyê bin.*

Gelek sipas apê hêja.

Roja Înê : 25-05-2007